



Redd Barna

Mafê hemî xwendekaran heye ku li dibistanê di hawîrdorek ewleh û baş de bin



LI NORVEÇ QANÛNEK JI BO XWENDEKARÊN DIBISTANÊ HEYE. EV QANÛN DIBÊJE KU:

- § Mafê te heye ku tu xwe di pola xwede û li dibistana xwe di ewlahîyê de hîs bikî.
- § Mafê te yê axaftinê û li te bê guhdarîkirinê heye. Gave tu ji mezinê re bêjî ku rewşa te, an jî hevalekî/e te ne başe, wê demê dibistan ji başbûna te an jî ya hevalê te berpirsyar e.
- § Hemû mezinên dibistanê berpirsyarin ku hûn xwendekar demek xweş bi hev re derbas bikin. Divê mezin ji xwendekaran re vekirî bêjin ku zordarî û hevdu acizkirin ne tiştêkî guncav e.

TU LI DIBISTANÊ DEMÊ NEXWEŞ DERBAS DIKÎ

- Tu xwe li dibistanê baş hîs nakî.
- Tu xwe bi tenê û li derve hîs dikî, û tu xwe di pola xwe de ewleh nabînî.
- Tu ji destê yek, an jî gelek xwendekaran, an jî ji yekî mezin zordarîyê dibînî.

NIHA TU DIKARÎ ÇI BIKÎ?

- Rewşa xwe ji yekî mezin ku tu pê bawer, an jî ji dê û bavê xwe re bêje. Alîkarîyê bixwaze ku tu ji mamostayekî re, an jî ji rêverbirekî re bêje.
- Ji bo ku tu dîsa xwe baş hîs bikî dibistan dê pîlanekê bike!
- Ger ev yek alîkar nebe hun dikarin şikayetê li ba Qeymeqam (Fylkesmannen) bikin. Erkê Qeymekam e ku guhdarbê da ku dibistanên navçeyê li gorî qanûn û rêgezê tevdibigerin.

REWŞA TE HEMA HEMA YE

- Te li dibistanê dest bi hîskirina ku tu tê vederkirin kirîye.
- Tu di pola xwe de dest bi hîskirina ku tu hindik di ewlehîyê de yî dikî.
- Tu ji hêla hin kesan ve acizkirina te dest pê kirîye edî tu nabî xwe.

NIHA TU DIKARÎ ÇI BIKÎ?

- Rewşa xwe ji mezinê ku tu pê bawer re bêje! Wek mînak ev kesê mezin dibe ku mamoste be, dibe ku hemşire be, kare rêveber be, an jî dikarin dê û bavê te bin.
- Mezin wê ji te re bibin alîkar da ku rewşa te di pola te de dîsa baş be.
- Ger te zordarî an jî tiştên nebaş li ser internetê an jî telefonê de jîyan kiribin girînge tu ji mezinê re bêjî, da ku ji tere bibê alîkar.

REWŞA TE BAŞE!

- Hevalên te hene.
- Kesên ku tu li gel diaxivî û pê bawerî hene.
- Tu dikarî bi xwe bî, û tu xwe di pol û li dibistanê xwe de ewleh hîs bikî.

NIHA TU DIKARÎ ÇI BIKÎ?

- Kesên din jî tevî listikê bike, û piştrast be ku rewşa her kesî baş e!
- Ji zordarîyê re bêje na, û ji yekî/e mezin re bêje heger tu yekî bibînî ku di rewşeke nebaş de ye.

Ronîya trafike yê reçetê bide te, ji bo ku demek xweş li dibistanê derbas bikê, da ku tu zanibê çî bikê.

Zêdetir di derbarê mafê xwe ji bo hawîrdorek baş û ewle li dibistanê li ser malpera reddbarna.no/skolemiljo bixwîne.

Tu dizanê ku li dibistanê nûnerê dijî zordarîyê (mobbeombud) heye, ku dikarê ji tere bibê alîkar?

Agahîyên zêdetir ji bo tîkiliya mobbeombud li ser vê malpera elevombudene.no bibîne